# ALFABE




www.netewe.com

# ALFABE

M. EMÎN BOZARSLAN

www.netewe.com

1968

Sim Matbaacılık Tel. 22 85 77

www.netewe.com

# 3
# Sısê

## PÊŞGOTIN

Amanca vê alfabê eve ku bı awakî hêsan xwendın û nıvîsînê hînê xelkê, xasma hînê xortan bı ke. Lê dı vê ku ev hînkırın bı alîkarîya xwendayan bê pêkanîn. Lewra xelk jı ber xweve nı kare hînê xwendın û nıvîsînê bı be.

Ev alfabe bı awakî wısa hatîye nıvîsîn ku, mırovekî xwenda bı alîkarîya vê alfabê dı demekî kurtda dı kare xwendın û nıvîsînê hînê gelek mırovên nexwendî bı ke.

Jı bo hêsan kırına vê yekê me Alfabê kır du pışk:

1 — Pışka herfên gır.

Me dı rûpela çaran û pêncanda herfên alfabê gışt bı herfên gır nıvîsî û lı tenışta her herfekî ayîna hebûyekî ku serê navê wî ew herfe çê kır, lı ber wê ayînê jî navê wî hebûyî nıvîsî. Bı vî awayî xwendevan, bı alîkarîya wan ayînan dı kare herfên alfabê yên gır bı hêsanî hîn bı be.

Pıştî wî me jı her herfekira rûpelekî cıhê kır. Dı vê rûpelêda me çend kelîmên ku bı wê herfê dest pê dı kın, lı bın wan jî çend cumlên ku serêd wan ew herfe nıvîsî.

Dı her rûpelekîda jî ayînekî lı gorî babetê cumlekî jı wan cumlan hat çê kırın.

2 — Pışka herfên hûr.

Pıştî xılasîya herfên gır me dı rûpela 32 û 33'yanda herfên alfabê gışt bı herfên hûr nıvîsî û dîsa lı tenışta her herfekî ayîna hebûyeki ku serê navê wî ew herfe çê kır.

Lı dû vana me jı her herfekî hûrra jî rûpelekî cıhê kır û dı wê rûpelêda berê çend cumlên ku bı wê herfê dest pê dı kın, lı dû wan jî babetekî ku serê wî ew herfe nıvîsî. Bı vî awayî xwendevan hînê xwendına herfên hûr ên dı nava cumlan û babetanda dı be.

Me dı her rûpelekîda jî ayînekî lı gorî babetê wê rûpelê çê kır.

Dı rûpela 60 û 61'êda jî me dîsa herfên alfabê gışt nıvîsî û lı tenışta her yekê aynîa dengekî ku bı wê herfê dest pê dı ke çê kır.

Dı rûpela 62'wanda jî me hejmaran nıvîsî.

Dı rûpela 63'yanda wekokekî pîrozeka cejnê û wekokeki pîrozeka sersalê hat nıvîsîn.

Dı rûpela dawîda jî wekokekî nameyê hat nıvîsîn.

Em hêvî dı kın ku bı alîkarîya vê alfabê xwendın û nıvîsîn dı nava xelkê meda belav bı be, û gelek xortên me dı demekî kurtda bı navberîya vê alfabê xwe jı tarîtîya nexwendî û nezanîyê der xînın, bı gîjın ronahîya xwendın û zanînê.





Ku ev hêvîya me bı cî bê, em dê xwe gelek bextewer bı hesıbînın.




Gelek sılav û evîn

27/3/1968





M. Emîn Bozarslan





www.netewe.com

| | | |
|---|---|---|
| A | AGIR |  |
| B | BEQ |  |
| C | CER |  |
| Ç | ÇAV |  |
| D | DÎK |  |
| E | ELB |  |
| Ê | ÊZING |  |
| F | FIND |  |

| | | |
|---|---|---|
| V | VIZIK |  |
| G | GUR |  |
| H | HÎV |  |
| X | XANÎ |  |
| I | | |
| Î | ÎSOT |  |
| J | JÛJÎ |  |
| Q | QELÛN |  |

www.netewe.com

| | | |
|---|---|---|
| K | KER |  |
| L | LÊV |  |
| M | MASÎ |  |
| N | NÊRÎ |  |
| O | OLK |  |
| P | PEL |  |
| R | ROVÎ |  |
| S | SÊV |  |

| | | |
|---|---|---|
| Ş | ŞÛR |  |
| T | TAJÎ |  |
| U | | |
| Û | | |
| W | WERÎS |  |
| Y | YEK |  |
| Z | ZEBEŞ |  |


**ALFABE**

www.netewe.com

# A

| | | | |
|---|---|---|---|
| AL | AV | AX | AP |
| AFIR | AGIR | AVIS | AZAD |

AX PIR BI XÊR Û BÊRE.
ADARE, DEW LI DARE.
AV ÇÛ SER CEH.
AFIR TIJÎ KAYE.



AZAD KUREKÎ JÎRE.

www.netewe.com

# B

BAV BEQ BÊR BÛK

BARAN BEROŞ BERAN BIZIN

BAVÊ MIN ÇÛ COT.
BEROŞ TIJÎ AVE.
BÛK HAT.
BA TÊ.

BARAN BARÎ.



www.netewe.com

# C

CAW CER CIL COT


CANÎ CEHŞIK CEWRIK COTKAR

CÛ TIJÎ AVE.

CEH ZER BÛN.

CAWÊ MALÊ PIR ZEXME.

CER AVÊ SAR DI KE.



COTÊ ME XURTE.

www.netewe.com


## NEH

# Ç

ÇAV ÇAR ÇEM ÇEK

ÇÊLEK ÇIRA ÇÎROK ÇÎYA

ÇEM RA BÛ.
ÇAVÊ MIN DI ÊŞE.
ÇAL TIJÎ ZADE.
ÇIRA VÊ KET.




www.netewe.com

# D

DÊ DAR DÎK DEST

DENG DERZÎ DIRAN DIRAV

DÛ JI KULEKÊ BILIND DI BE.
DÛVÊ BERANÊ ME GIRE.
DAYÊ ! NAN BI DE MIN.
DAR SÎ DI DE SER ME.



DÎK ÇÛ SER SERGO.

www.netewe.com

YAZDE

# E

EZ EM ELB ERD

EVÎN ENÎŞK ERZAN EZMAN

ELBÊ BÎNE, EZ ÇÊLEKÊ BI DOŞIM.

EZ JI BER PÊZ TÊM.

EM ÇÛN MAL.

EZ Û TU HEVALIN.

EVÎN JI AVÊ TÊ.




www.netewe.com

# Ê

ÊŞ ÊL ÊDÎ ÊMO

ÊVAR ÊRE ÊRÎŞ ÊZING

ÊŞA ÇAVAN ZORE.
ÊL ÇÛ ZOZANAN.
ÊMO JI BÊRÎYÊ ZIVIRÎ.
ÊVAR HAT, BÛ TARÎ.





ÊZINGAN BÎNE,
EM AGIR DA DIN.

www.netewe.com


SÊZDE

# F

FER FIND FIRK FATÊ

FÎKÎ FEQÎ FIRAQ FERAT

FÎKÎ LI SER DARÊ GÎHANE.
FERAT ÇEMEKÎ MEZINE.
FATÊ KEÇEKE JÎRE.
FIND VÊ KET.



FIRAQ TIJÎ SAVARE.



www.netewe.com

# V

VA VIR VAN VALA VARIK VIZIK

VIREK VEŞARTOK

VIR NE BAŞE.
VANA BERXÊN MENE.
VÊ MÎYÊ BI BE ÇÊRÊ.
VAN GAYAN BI
BE GARANÊ.

VAME EZ DI ÇIM
BER ÇÊM.



www.netewe.com


## 15
## PAZDE

# G

GA GUR GÛZ GOŞT GORE


GENIM GOLIK GOVEND





GAYÊ REŞ PIR XURTE.
GUR KETE NAVA PÊZ.
GÎYA DI DE ÇOKA MIN
GENIM SERIDÎ.

GOVEND GEŞ BÛ.



www.netewe.com

# H


HÊK HÎV HIŞK HESP

HEVAL HEVÎR HESTÎ HESIN

HEVALÊ MIN HAT.
HESIN GIRANE.
HÎV DER KET.
HÊK SIPÎYE.



HESP DI MÊRGÊDA DI ÇÊRE.



www.netewe.com

## 17
## HIVDE

# X

XAL XEW XÊR XORT

XEBAT XÊLÎ XIZAN XUŞK

XEWA MIN TÊ, XEWA TE NAYÊ.
XAL Û XWARZÎ ÇÛN BAJÊR.
XÊLÎYA BÛKÊ SOR Û ZERE.
XEZAL LI ÇÎYA DI ÇÊRIN.

XEBAT PIR XWEŞE.



www.netewe.com

## 18
## HIJDE

# Î

ÎRO ÎSAL ÎŞEV ÎCAR ÎSOT ÎNCAS

ÎSAL KED PIRE.

ÎCAR TU BI LÎZE.

ÎRO TAV GERME.

ÎSOTÊ DEVÊ MIN ŞEWITAND.



ÎŞEV HÎV PIR ROHNÎYE.

www.netewe.com

# J

| | | | |
|---|---|---|---|
| JIN | JÎN | JÊR | JOR |
| JEHR | JENG | JÊHATÎ | JÛJÎ |

JÛJÎ MARAN DI KUJE.

JÊR ERDE, JOR EZMANE.

JIN KEVANÎYA MALÊYE.

JÎN PIR XWEŞE.



JIN Û MÊR HEVALIN.

www.netewe.com

# Q


QAZ QÎR QÛÇ QURE

QELÛN QORIK QIJIK QULING

QELÛNA BAVÊ MIN TIJÎ TITÛNE.
QORA GOVENDÊ TÊ Û DI ÇE.
QULING JI BERÎYÊ HATIN.
QIJIK PENÎR DI DIZE.



QAZ LI SER AVÊ DI GERIN.



www.netewe.com

# K

KA KEÇ KÊR KEW

KADÎN KEKO KEVOK KÛÇIK

KEÇIKÊ JI BAVÊ XWERA TAŞTÊ BIR.
KERÊ ME ÎŞEV LI DERVA MAYE.
KEW LI SER ZINAR DI XWÎNE.
KURIK ÇÛ NÊÇÎRA KEWAN.

KEÇIK ÇÛ SER KANÎYÊ.



www.netewe.com


# 22
## BÎST Û DIDU

# L

LAW LÊV LÎÇ LING

LÎZTIK LIHÊF LORÎ LÛLE

LÊVÊN MIN JI TÎNAN ZIWA BÛN.
LINGÊ BERXA ME ŞIKEST.
LIHÊFA MIN PIR DIRÊJE.
LÎÇ TIJÎ AVE.



LAWIK SIWARÊKÎ BAŞE.

www.netewe.com

# M

MÎ MAR MAST MASÎ

MIŞK MIZGÎN MEZIN MIRÎŞK

MAR NEYARÊ MIROVE.



MÊRGA ME TIJÎ NEFELE.

MALAN BAR KIRIN, ÇÛN ZOZANAN..

MASÎ DI AVÊDA MEZIN DI BIN.

www.netewe.com

# N

NAN NAV NÎK NOK

NEYAR NEWAL NEYNÛK NÊÇÎR

NAN Û PÎVAZ XWARINA BIRÇÎYANE.
NÎKA TEŞÎYA MIN JÊ DER KET.
NOK ÇÛ BAJÊR, BÛ LEBLEBÛ.
NAVÊ GUND NAMÛSA GUNDE.

NÊÇÎRVAN LI ÇÎYAN
NÊÇÎRÊ DI KE.



www.netewe.com

# P

PEZ PÎR POR POZ

PALE PÎVAZ PEYA PISÎNG

PÎREK DI ÇINE BÊRÎYÊ.
PEYAKÎ, MIZGÎN JI MERA ANÎ.
POR XEMLA KEÇANE.
PALE HATIN TAŞTÊ.



PEZ LI ZOZANAN DI ÇÊRE.


www.netewe.com

# R

REZ RÊ ROJ RÛN

REWŞ RÊWÎ RAST ROVÎ

RÛNÊ GAMÊŞAN JI YÊ BIZINAN PIRTIRE.
RÊYA RAST, RÊYA EVÎNA WELATE.
ROVÎ DIJMINÊ MIRÎŞKANE.



REZÊ ME PIR QENCE,
TIRÎ DI DE ME.

www.netewe.com

# S

SAR SAL SÊV SOL

SAVAR SERMA SERSAL SIPÎ

SERSALA WE PÎROZ BE.
SAL SÊSED Û ŞÊST Û PÊNC ROJE.
SERÊ MIN DI ÊŞE, EZ JI BER GÊJ BÛM



SERMA MIROV NEXWEŞ DI XE.

www.netewe.com

# Ş

ŞÊR ŞÎV ŞÛR ŞÛV

ŞAPIK ŞAMÎ ŞEMÎ ŞIVAN

ŞAL Û ŞAPIKÊ BAVÊ MIN DIRÎYAN.
ŞÊR ŞÊRE, ÇI JINE ÇI MÊRE.
ŞÛRÊ VÎ ZEMANÎ QELEME.
ŞÛVA ME ÎSAL TUNNE.



ŞIVAN PÊZ DI ÇÊRÎNE.

www.netewe.com

# T

TAV TIRŞ TÛJ TOV

TARÎ TAZÎ TAŞTÊ TEFŞO

TAŞTÊYA MIN NAN Û MASTE.
TIRSONEK TIM LI PAŞIN.
TÛRÊ VIREKAN TIM QULE.
TAS TIJÎ AVA ZELALE.



TARÎ BÛ, EM
DI ÇIN MALÊ.

www.netewe.com

30
SÎ

# W

WÎ WAHŞ WEŞ WAN

WELAT WERE WERÎS WESTAN

WERE EM BI ÇIN BAJARÊ WAN'Ê.
WAHŞ PÎVAZÊ DI EVÎNE.
WERÎSÊ RIZÎ BÊ KÊRE
WAY LI MINO BAVO !



WELATÊ MIN MEZINE Û XWEŞE.



www.netewe.com

# Z

ZÛ ZÊR ZIK ZÎN








ZAVA ZARÛK ZEBEŞ ZOZAN

ZIVISTANÊ BERÊ DERÎ JI ME GIRT
ZIKÊ XIZANAN TIM BIRÇÎYE.
ZAVA ÇÛ SER XÊNÎ.
ZEVÎ TIJÎ GENIME.




ZARÛK BI HEVRA
VEŞARTOKÊ DI LÎZIN.






www.netewe.com

| | | |
|---|---|---|
| a A | agır |  |
| b B | berx |  |
| c C | cer |  |
| ç Ç | çîya |  |
| d D | destar |  |
| e E | elb |  |
| ê Ê | êzıng |  |
| f F | fırınde |  |
| v V | vızık |  |
| g G | golık |  |
| h H | hesp |  |
| x X | xezal |  |
| ı I | | |
| î Î | încas |  |
| j J | jûjî |  |
| q Q | qıjık |  |

www.netewe.com

| | | |
|---|---|---|
| k K | kûçık |  |
| l L | lepık |  |
| m M | mışk |  |
| n N | nêrî |  |
| o O | olk |  |
| p P | pısîng |  |
| r R | req |  |
| s S | sol |  |

| | | |
|---|---|---|
| ş Ş | şamî |  |
| t T | teşî |  |
| u U | | |
| û Û | | |
| w W | werîs |  |
| y Y | yek | 1 |
| z Z | zebeş |  |

**alfabe**

www.netewe.com

# a

Agır vê ket.
Azadî gelek xweşe.
Ax bı avê ve dı jî.
Ala mın pêl dı de.





**Ax merde**

Axa mın gelek merde,
Genım dı de mın, nan dı de mın.
Ez zıbıl dı dımê, av dı dımê,
Ew ked dı de mın, dan dı de mın.

www.netewe.com

# b



Bav mezınê malêye.
Bavê mın jı mınra sol kırî.
Bûk lı zavê pîroz be.

**Bêrî**

**Pez hate bêrîyê, bı guhanên tıjî.**

**Berx hatın nava pêz, dıle tevan dı bıjî· şîr, pır dı bıjî.**


**Bû kalîna berxan.. Her yekê dîya xwê dît û bı guhanê wê mıjî.**

**Bêrîvanan jî pez dotın, elban tıjî şîr kırın û gotın: "Bı jî pezê me bı jî!"**




www.netewe.com

# C



Cılê nû zarûkan kêfxweş dı ke.
Cenan avê bır ser zebeşan.
Cotê me çar gayîye.
Cejna we pîroz be.





**Cot**

**Cotê me dıdune: Cotek ga û cotek jî gamêşın.**
**Her du ga lı paşın, gamêş jî lı pêşın.**
**Halet û gîsınan lı pey xwe xweş dı kêşın.**
**Axê dı qelêbın, xet bı xet dı qelêşın.**

www.netewe.com

Ç




Çemê mezın jı çîyaê bılınd tê.

Çîrok, şevên zıvıstanê xweş derbaz dı kın.

Çar mî bı hevra dı çêrın.

Çerçî hat gundê mê.



**Çem**

**Çemê mezın, çemê tıjî av, çemê cıwamêr.**

**Jı mera ava jinê tîne.. jı jor tîne jêr.**

**Em lı serê sukur ava dı kın, jê der dı xın elektrîka rohnî, a wek zêr.**

**Em pê zevîyan jî av dı dın.. jı wan dı gırın gelek ked, gelek xêr û bêr.**

www.netewe.com

# d



Dê û bav mezınê mene.

Dıbıstan kana zanînêye.

Dara xebatkaran tım bı bere.

Dıranê dotmama mın dı êşe.

Dapîra mın jı mınra çîrokan dı bêje.




**Dıbıstan**

**Îsal dı gundê meda ava bûye dıbıstan.**

**Em tev têda dı xwînın, qelem-defter dı destan.**


**Dı xebıtın em her gav, nı zanın çîye westan.**

**Çıqas xweşe ev xwendın! Bı jî bı jî dıbıstan!**

www.netewe.com

## Sî û neh

# e



Ez û bavê xwe dı çın bajêr.

Evîna welat jı her tıştî bılındtıre.

Ezman bı sıtêran tê xemlandın.

Em îro dı çın ser rez.



### Ez û pez

Ez dı çım ber pêz, pezê xwe dı çêrînım.


Pezê xwe dı bım, lı mêrgan dı gerînım.

Çaxa bêrîyê, ez pezê xwe ber bı mexel tînım.

Çaxa şevînè jî pıf dı kım bılûré, pezè xwe lı dora xwe dı cıvînım.

www.netewe.com

# ê



Êrîşa gur, pez dı tırsîne.
Êdî em na çın ber çêm.
Êmo elba xwe gırt, çû bêrîyê.
Êzıngvan çûn dehlê jı bo êzıngan.
Êvare êvare, şîva me goşt û savare


**Êvare garan hat**

**Êvare, roj çû ser ava, garan hat nava gund.**

**Bû orîna çêlekan û golıkan,**

**Xort û keç baz dan pêşîya garanê.**

**Her yekê dewarên xwe ve qetand, ber bı malê ajot.**



www.netewe.com

# f




Fırfırokê xwe avêt êgır.

Fîkîyê zıvıstanê agıre.

Fında zavê vê xıstın.

Fıraqên me nû hatıne kırîn.

Feqî lı sîya darê razaye.



Fında zavê

Dılane dılan.. Dılana Xezalê û Lezgîn'e..

Bırazava fından vê dı xe û dı nava hennêda dı çıkîne.

Memo tebeqa fından dı gıre û lı ser zavê dı gerîne.

Xort çepıkan dı kutın û dı sıtırên... Tev bı kêf û şadîne.

www.netewe.com


# V

Veşartok jı zarûkanra lîztıkekî xweşe.
Vırên derewçînan rûwêd wan reş dı kın.
Varıkên nû rabûne, hêkên sor dı kın.
Vata ra me keve, tu dê serma bı gırî.



**Veşartok**

— Haydên, em veşartokê bı lîzîn.
— Delal! Tu çavên xwe bı gıre..
— Başe.. Haydên, xwe veşêrın...
— Ku me got: "Helal", çavên xwe veke û lı me bı gere..
— Helaaal, xweş helaaal!..
— Hêêêl!. Delal, te mın ne gırt...
— Ebbooo!.. Şêro. mın te gırt... Îcar tu çavên xwe bı gıre...



www.netewe.com

# g



Goştê gur, ker û se nayê xwarın.


Golıkê malê jı gayê malê na tırse.


Gavanê gundê me xortekî lezgîne.

Gorê rîs, zıvıstanê lıngan germ dı gıre.

Goşkar jı çerm solan çê dı ke.

Golıkvan golıkan bır çêrê.





**Gayê Qîro**

**Gayê meyê reş, navê wî Qîro'ye.**

**Cotê me dı ke, zevîya me dajo, şûvên me tıjî dı ke.**

**Bêdera me dı kute, moşenê dı kêşe.**

**Ez jî lı moşenê sıwar dı bım, moşen pır xweşe.**

www.netewe.com



# h

Haydê em bı çın ser bêderê.
Hêlîna kewê tıjî hêkın.
Hevîr dı teştêda tırş bû.
Hevalê mın jı deştê hat.
Here ber berxan!



**Hespê kumeyt**

**Hespê kumeyt meşaye, bı rewanî dı meşe.**
**Serê wî tım bılınde, kef jı devê wî dı reşe.**
**Bêjîyê wî lı ber bayê lı rast û çep dı weşe.**
**Bı jî hespê kumeyt! Meşa te gelek xweşe!..**

www.netewe.com

# X




Xew jı zarûkanra pır başe.

Xwarına gundîyan nan, dew û pîvaze.

Xort jı cot hatın, Xwedê xortan bı hêle.

Xuşka mın jı xezûrê Xwera pır başe.

Xwestîya kekê mın cotek gore da mın.




### Xwenda û nexwendî

Kesê xwenda zanaye, nexwendî jî nezane.

Kesê xwenda tım têre, nexwendî her xızane.


Xwenda tım pêşewaye, nexwendî lı ber pezane.

Qedrê xwenda bılınde, nexwendî tım erzane.

www.netewe.com

Çıl û şeş

# Î



Îşev gur hat pezê me.

Îro zavayê me tê mêvanîya me.

Îsal ez dest bı çûna dıbıstanê dı kım

Încasên bexçê me qedîyan.

Îsot û fırıngî tev gîhîştıne.



## Îsal genım pire

Îsal zevîyên me pır ked dane.

Bêder tıjîne, genım bı komane.

Genım tov û savare, genım dexl û dane.

Genım dewlet û dırave, genım jîn û nane.

www.netewe.com

## Çıl û heft

# j

Jı mehan û salan, carekî mêvanê xalan.

Jorê çîya dahle, jêrê çîya mêrge.

Jana zırav, nexweşîkî pır dıjware.

Jın û mêr hevalın.







Jın

Jın hevalên mêranın, hevalên wanê jînê û karın..

Jın nîvê milletın, dı welat û milletda xwedî parın.

Dı vê em qedrê jınan bı zanı bın, jı wanra tım baş bın.

Kesên ku lı jınan serdestî bı kın, bı zanı-bın ku ew zordarın..

www.netewe.com

Çıl û heşt



# q


Qeşmer zarûkan dı kenîne.

Qîr, rêyan tım paqıj dı gıre.

Qırıka mın jı sermayê hat gırtın.

Qulıngên deşta Mûş'ê jorda hatın.

Qencî, tım xwedîyê xwe dı de evandın.



Qaza me

Qaza me xweşıke, dı meşe bı naz.

Gewrîya wê xwar û zırav û dırêje, wekî gaz.

Dı golêda ajnê dı kę, lı ser avê dı meşe.

Carna jî dı qîre, dengê wê mînaye dengê saz.

www.netewe.com


# k


Kûze îşev hat, mırîşkên me tev fetısand.

Karker û cotkar jı bona welat dı xebıtın.

Kûçık da dû gurê har.

Kêra te tılîya mın bırî.





**Kerê reş û gula geş**

**Kerê meyê reş, loqîya û çû ber gula geş.**

**Gulê bîn kır û pozê xwe bılınd kır, go: "Ev ne xweşe, ne xweş"**


**Baz da çû ber kerbeşê, xwar û zıri, go: "Her bı jî kerbeş!"**

**Qedrê gulê çı zanıt?. Kerbeş dı vêt kerê reş.**

www.netewe.com

## Pênce

# l




Lıngê berxê dı qevdêda şıkîya.
Law û keç bı hevra dı lîzın.
Lezgîn, kurekî jêhatîye.

### Lorî, Lorî..

– Zînê!. Razê, ku tu mezın bı bî, herî dıbıstanê.

– Dayê!. Ma tu dê mın bı şînî dıbıstanê?

– Erê keça mın!. Ez dê Zîna xwe bı şînım dıbıstanê.



– ........................ ........

– De lorî, lorî... Zîna mın lorî...


Ez Zîn'a xwe dı hejînım.
Bı şîr û şekır dı mıjînım.
Pê xemê dılê xwe dı revînım.

Ez dê şara serê xwe bı fıroşım, pê jı Zîn'a xwera defter û qelem bı sıtînım.

Zîna xwe bı şînım dıbıstanê, wê jı nezanî û xızanîyê bı derînım.

www.netewe.com

# m




Moşen bêderê dı kute.

Mala apê mın lı perê gunde.

Mışk jı pısîngan pır dı tırsın.

Malxoyê malê, mızgîna mın mırîşkekî da.




Mamostayê gundê me

Mamostayê gundê me, xortekî gelek jîre.

Jı dıl dersa zarûkan dı de, jı wanra wek bav û bapîre.

Dema ders dı qedın, tım pırtûkan dı xwîne.. Pır jî bı bîre.

Jı gundîyanra jî pêşewaye.. Rêya jînê nişanê wan dı de.. jı wanra destegîre..

www.netewe.com

Pênce û dıdu



# n


Nan û mast, xwarına rast.

Nan û dew, xwarına derew.

Neynûk û goşt jı hev na qetın.

Ne ez tenê, her kes xwendınê dı evîne.






**Nêçîrvanê kewan**

Nêçîrvanê kewan sıbê ra bû, rextê xwe gırê da û tıfınga xweya cotık avêt mılê xwe, qefesa kewa xweya marî jî gırt destê xwe û çû kozıkê.. Kewa marî danî ser zınarê hemberê kozıkê, lı dorê jî lext reşand û xwe dı kozıkêda veşart.. Marî dı hênıkayîya sıbêda dest bı xwendınê kır û got: "Qaqıbo, qaqıbo, qaqıbo". Kewên kûvî ku dengê marîyê bıhîstın, bı dılsafî tev hatın lı dorê cıvîyan û bılîyê xwarına lext bûn.. Aha dı wê gavêda nêçîrvan jı kozıkê tılîya lûlekî tıfınga xweya cotık kışand, tıfıngê go: "Gummm"; hema pêre tılîya lûla dın jî kışand, dîsa go: "Gummm". Kewên reben tev lı ser axê hatın raxıstın. Lê marîya bê bexta ku wan da kuştın hêj jî dı xwend, dı go: "Qaqıbo, qaqıbo. qaqıbo..."

www.netewe.com



# p


Pozê keçıkê bı xızême.

Payîzê pel jı daran dı weşın.

Pısîngê dı kulînêda mışkekî gırt.

Pêşemê, pısmamê mın jı paleyîyê tê.

Pışt bı kesên durû nayê gırêdan.



Pêncok

— Şêro!.. Rındê!.. werın em bı pêncokan bı lîzın.

— Haydê Memo!.. Pênc xîçık bîne..

— Aha pênc xîçık!.. Haydên, em dest pê kın

— Zînê!.. Tu ketî, îcar dora mıne..

www.netewe.com

# r




Rêya me îsal hat gırtın.

Rovî lawırekî pır bı deke.

Rızgo, rext û tıfınga xwe lı mal danî.

Rûwê reş, hewcê tenîyê nîne.

Req der ketîye jı avê, xwe daye ber tavê.





## Rezê me

Rezê me pır xweşe, mêwên wî bı pel û serbenene.

Weşîyên wî pır gırın, hemî tıjî şîrene.

Dema ser rezan, lı her derê agır vê dı kevın, wek mêledene.

Lı mala xwedîyên rezan dıms û bastêq û meşlûr hene.

www.netewe.com



# S

Serê kesê rast tım bıhınde.


Serma hat, hechecık çûn.

Sîr û pîvaz û îsot bırayê hevın.

Sêv lı ser darê sor bû.

Solê sor zarûkan kêfxweş dı ke.

Sıtêra sıbê der ket, apê mın jî bı rê ket.



Sersal

— Serê salê bınê salê, Xwedê bı hêle xortê malê.

— Doni-moni malava, Xwedê xortê malê bı ke zava.

www.netewe.com


## Pênce û şeş

Ş 

Şamî zıvıstanê bı gûzan qelew dı be.

Şıkeft bı şev xanîyê lawırane.

Şîr vexwarınekî pır xweşe.





### Şıvano !

Şıvano, şıvano!.. Şıvanê pezê sor!..


Tu bı kulafê xweyê sıpî lı ser mêrgan dı gerî qor bı qor..

Dı sarîyanda dengê bılûra teya zer dı çe berjêr û berjor..


Tu her sıbe helatına rojê dı binî.. xwezî bı te, lo şıvanê pezê sor!..

www.netewe.com

# t



Tûrê vırekan tım qule.
Ta jı kermêşan çê dı be.
Temezîya mın kesk û sore.
Taştê, lı canê her kesê xweş tê.
Tajîyê tûle, tım lı pey nan dı çe.



**Teralî ne başe**

**Teralî karekî ne başe, pır û pır bê xêre.**

**Tu kesekî teralan na evîne.. Çı lı gund be, çı jî lı bajêre.**


**Kesê teral tım bırçîye, tım tazîye û bê kêre.**

**Kesê xebatkar jî bejna wî nûye, berîka wî tıjîye û zıkê wî têre.**



www.netewe.com

W



Wax-wax! Memo jî çû.

Wan, bajarekî kevne, lê gelek xweşe.

Westan jı kesê nexweşra ne başe.

Wî kerî lı tewlê gırê de.





**Welatê mın**


Welatê mın pır xweşe, pır û pır şêrîne.

Têda tıjî mêrg û bexçene, tıjî çem û kanîne.

Lı her derê dahl û nıft û maden û zevîne.

Ez welatê xwe pır dı evînım, canê xwe jêra dı kım gorîne.

www.netewe.com



# Z


Zînên hespan nuha erzanın.

Zarê xwe baş hîn bı be.

Zarûk jı dıbıstanê zıvırîn.

Zıvıstan hat, berf dı bare.

Zılamê baş lı hemî deran tê evandın.





## Zozanê me

Zozanê me gelek hênıke, tıjî ava sare.

Em havînan dı çın zozan, lı wê çê dı kın ware.


Lı mêrgan dı çêrînın pez û berx û kare.

Payîzan em berê xwe dı dın gund, jı zozan tên xware.


www.netewe.com

# 60

## Şêst



| | |
|---|---|
| A | Ayyy! |
| B | Booo! |
| C | Cîîîk |
| Ç | Çık çık çık |
| D | Deehh! |
| E | Elo! |
| Ê | Êhhê hê hê hê! |
| F | Fırrr |
| V | Vızzz |
| G | Gummm |
| H | Haw haw haw |
| X | Xıxxx |
| I | |
| Î | Îhhî îhhî îhhî |
| J | Jıjjj |





www.netewe.com

**Şêst û yek**










| | |
|---|---|
| Q | Qî qıla qî qîîî |
| K | Kışşş |
| L | Lo loooow! |
| M | Meee |
| N | Nawww |
| O | Oxxx! |
| P | Peppûûk |
| R | Rep rep rep |
| S | Sısss |
| Ş | Şooooşş |
| T | Tû tû tû tû |
| U | Uhhu uhhu |
| Û | Ûûûû |
| W | Were were were |
| Y | Ye ye ye |
| Z | Zırrr |





www.netewe.com

Şêst û dıdu

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yek | Dıdu | Sısê | Çar | Pênc | Şeş | Heft |


| 8 | 9 | 10 | 11 | 12 | 13 | 14 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Heşt | Neh | Deh | Yazde | Dıwazde | Sêzde | Çarde |

| 15 | 16 | 17 | 18 | 19 | 20 |
|---|---|---|---|---|---|
| Pazde | Şazde | Hıvde | Hıjde | Nozde | Bîst |

| 30 | 40 | 50 | 60 | 70 | 80 | 90 | 100 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Sî | Çıl | Pênce | Şêst | Heftê | Heştê | Nod | Sed |

| 1000 | 10,000 | 100,000 | 1,000,000 |
|---|---|---|---|
| Hezar | Dehhezar | Sedhezar | Mılyon |

1,000,000,000
Mılyar




www.netewe.com


## Şêst û sısê



Cejna we pîroz be

Ez cejna we pîroz dı kım, gelek rojên bı kêfxweşî û dılfereyî daxwaz dı kım, sılav û evînên xwe pêşkêş dı kım.

Mızgîn



Sersala we pîroz be

Ez sersala we pîrez dı kım, gelek salên bı kêfxweşî û dılfereyî jı wera daxwaz dı kım, sılav û evînên xwe pêşkêş dı kım.

Rewşê

www.netewe.com

64

# Şêst û çar

Diyarbekır
21/3/1968

Bırakê mınê heja Memo,

Ez jı zûve dı xwazım jı tera name bı şinım. Lê jı ber xebata dı dersanda mın heta nuha fersenda nıvisinê ne dit. Ez hêvi dı kım ku tu dê lı mın ne gırî.

Tu çawayî? Dersên te çawa dı çın? Lı Wan'ê çı heye, çı tunne? Jı bıl xebata dı dersanda tu çı dı kî, Wextê xwe yê vala bı çı dı hêjini? Mamostayên dıbıstana we çawanın? Tu jı wan dılxweşî, yan na?

Ku tu pırsa mın bı kî ez başım. Pırê wextê mın bı xebata dı dersanda derbaz dı be. Wextê mın ê vala pır hendıke. Ez vi wextê xwe jî bı xwendına pırtûkên bêjeyî dı hêjînım. Carna jî dı çım ser Zınarê Fisê lı Dîclê dı nêrım, û bı vî awayî bina xwe der dı xım, xemê dûriya jı malê dı revinım.

Dersên mın baş dı çın. Ez bawer dı kım ku ez dê dı dawiya sala xwendınêda jı sınıfa xwe bı bûrım. Mamostayên me pır başın, jı dıl dersa me dı dın û pır me dı evinın.

Ez hêvî dıkım em herdu jî dê jı sınıfêd xwe bı bûrın û pıştî xılasiya dıbıstanê lı Cızir'ê bı gîjın hevdû, bı hevdûra havine ki xweş derbaz bı kın.

Ez pıştî xılasîya dersan qet lı vır ra na westım, hema bı rê dı kevım. Gelo tu dê kengê bı rê kevî?

Dı vê tu bersîva vê nameya mın zû bı şini, ez çavnêrî dı kım.

Ez dı dawîyêda gelek sılav û evînan pêşkêş dı kım, bı kovan çavên te maç dı kım. Serkeftın û dılxweşiya te daxwaza mıne. Tu bı dılxweşî bı mînî.

Bırakê te

Zana




Buha : 250 Quruş

www.netewe.com